# Newroz



**_Dr Nûredîn Zaza_**
_1919- 1988_



**_Osman Sebrî_**
_1905 - 1993_

_Xebat ji bo_ : * **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .**
* **Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .**

**_Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê_** - **YEKÎTÎ**

**_Hejmar (101 ) sal 17 Sibat 2012 z - 2623 k Buha ( 15 )ps P.S_**

## Gotina ji Konferensa Helêrê ya kurdên Sûriyê re

**Beşdarên birêz…**
**Silav û rêz…**

Tête zanîn ku , di siha karbedestiya rijîma Be'is de , eve 49 salin ku gelê Sûriyê bi kurd û erebên xwe ve , ji Alfebeya demokrasiyê û mafên mirovan bêpar e . Bi ser de jî , di derbarey gelê kurd de , nijadperestî , şoventî û siyaseta fermî ya înkarkirina hebûna kurd her li dar e .

Newekhevî , tund û tûjî , çi bi dizî çi aşkere , di jiyana civaka Sûrî de , bi gelek şêweyan rû daye û dide , lewre jî gelê Sûriyê serûber bi êş û xeman hestedar e.

Di dema îro de , xemgîniya gelê kurd li Sûriyê , li beramber û di çerçewa tabloya Sûriyê de , ne tenê ji ber tund û tûjî û berdewamiya herikandina xwînê li hinde herêmên Sûriyê ye , lê belê , ji ber mijdarî , nakokî û nelihevkirina hêzên rikebiriya Sûriyê ye jî .

Rikebiriya Sûrî çendî di Medya erebî û ya cîhanî de tête binavkirin û rengdan , lê mixwabin ewqas jî di hundirê xwe de nexweşî , nakokî û nelihevî ye , ji ber ku , jiyan û pêvajoya hêzên siyasî di hundir civaka Sûrî , di siha desthilatdariya parta Be'is de , li dirêjahiya ewqas sal , têra xwe hatiye jihevxistin û pişaftin , lewre jî mafê kurda ye jî , ku di qonaxeke weha de , xwedî navnîşaneke siyasî , nûnertiyeke serbixwe **D.R.(11)**

**Şoreşa gelê Sûriyê Qeyran di qeyranê de** **Rozad Elî** — **3**

**Bîranîna xebatkar M.E.Xoce** **Dr. Xelîl Ebdela** — **4**

**Panorama rêresma ya nemir Dr. Şêrzad H R** — **6**

**Nivîsandina bi zimanê Kurdî pêdiviyeke netewî ye** **Mûsa Zaxuranî** — **9**

_Email : Newroz 95 @ hotmail . com_

www.arsivakurdi.org

## Xebatkarê Kurd ê navdar Nesredînê Birhik hate kuştin!

Piştî nîvro a roja Duşembê 13ê Sibatê, kesine çekdar û ne diyar, li devera Aliyan, navçeya Çelaxa, hovîtî û zikreşiya xwe nîşan dan û 13 gule berdane tirumpêla birêz Nesredînê Birhik, du guleyan bi kûrî ew birîn kirin. Berbanga roja Çarşembê 22ê Sibatê, li nexweşaneyeke bajarê Helebê, jiyana xwe ji dest dide û diçe ber dilovaniya Xwedê.



Li gundê Kevirê Dena devera Aliyan sala 1960î kek Nesredîn ji dayik dibe, xwendina xwe li bajarokê Çelaxa diqedîne û paşê diçe Dêra Zorê, li wir du salan li peymangeha pîşesaziyê- beşê kehrebê dixwîne û wê jî diqedîne. Birêz Bavê Alaa, tevî rêzên partî dibe û sala 1988an dibe endamê komîta navendî. Weke mirovekî comerd, cegerdar û dilsoz di nava hevalên xwe de tê naskirin. Di hemû çalakiyên cemawerî de, nemaze di bûyerên sala 2004an de, ew serkêşiya gelek xwepêşandanan dike û weke xebatkarekî kurdî cemawerî li deverê û herêmê bi tevyî tê naskirin.

Roja 22ê Sibatê, bi dehên hezaran kes ji welatparêzên Kurd û tevgera siyasî û ciwanên Kurd û çalakvan bi darbesta wî re kar bûn û pê re çûne gundê wî. Li Qamişlo, Tirbespiyê û Çellaxa, li gundên derdora riya Dêrikê, xelkên kurd li hêviya hatina darbesta wî man da ku terorkirina wî protesto bikin û xatirê dawî jê bixwazin. Demjimêr 6ê êvarî, li gundê Kevirê Dena bi beşdariya 10 hizar mirov hate veşartin, wan: gelek gotin û helbest li ser hatin xwendin, ji gotina Encûmena Niştimanî Kurdî Li Sûriyê û gotina parta wî ji bal birêz Behzad Dorsin ve hate xwendin.

Bila cihê pakrewanê me buhuşt be û serê malbata wî, hevalên wî û gelê kurd sax be.

Bi vê bûneya diltezîn, komîteya NEWROZê, bîhînameya jêrîn ji partî û malbata pakrewan re şandibû, ev e deqa wê ye:

## Behîname

Birayên hêja, dost û hevalên P.D.K.S
Malbata pakrewan Nesredînê Birhik…

Di baweriya seqet a hov, zikreş û kujeran de, tund û tûjî, lêdan, girtin û kuştina mirovan dikarin ji dozên rewa re bibine derman û çareserî…Ji wan weye ku, bi van karên xwe yên kirêt û gemar, wê karibin gelê me çavtirsandî bikin, rê li ber çareserkirina doza wî ya dadmend û rewa bigrin.

Lê belê, ew texmîn û boçûnên wan şaş in, ji ber ezmûnên gelan teqez kirine ku kuştin û terorkirina xebatkaran, xebata netewî gurtir û yekîtiya hêzên gelan xurtir dike. Bila kujerên destbixwîn zanibin ku, qurşîn û guleyên wan nikarin me ji doza gelê me dûr bikin û baweriya me bi jiyaneke azad û aştiyane qels bikin.

Di vê şîn û behiyê de, di komîta rojnameya NEWROZ a bi zimanê Kurdî de, em xwe xembar û hevpişkê derd û êşa we dibînin.

- Serê gelê me yê Kurd sax be!.
- Serbilindî ji pakrewanê Kurd Nesredînê Birhik û hemî pakrewanên şoreşa Sûriyê re!.

24.02.2012
Weşana **NEWROZ**

www.arsivakurdi.org

# Şoreşa gelê Sûryê.. Qeyran[1] di qeyranê de!!

**Rozad Elî**

Li panzdehê meha Adarê, salek di ser raperîna gelê Sûriyê re derbas dibe, ev jî demeke pir dirêj e ji raperînên gelêrî yên aştiyane re, û belkî ta roja îro, dîrokê ti şoreşên gelêrî yên aştiyane bi ev dema dirêj tomar ne kiriye. Ji ber ku, û li gor baweriya nêrevanên siyasî, di demeke wiha de, bi tevahî, yan rijêm têk diçe û gel bi ser dikeve, mîna nimûneyên Misir, Tûnisê di sala 2011an de, Îranê di sala 1979an de, û piraniya dewletên rojhilata Ewrupayê li destpêka salên nodî ji sedsala borî. Yan jî rijêm berxwe dide, û di demeke kin de serhildanê ditemrîne, mîna nimûneyên Çînê li destpêka salên nodî ji çerxa borî, raperîna rikberên Îranê berî du salan… û hwd.

Lê belê! xuyaye ji her zagonekê re awarte hene, nemaze jî di warê siyasetê de, û bi taybetî jî di çarçewa guherîna destlat û sazûmanên rikêş û destgiran de, mîna sazûmana El Be's li Sûryê û li berî wê jî li Îraqê.

Di rewşên wilo pir pengijî û qeyranbar de, û li dema ku sazûman diktetor be, hêz wê xort û li ser hev be, û biryar jî standibe ku destlatê bernede, û li aliyê din jî, dema ku rewşa gel pir kambax bibe, û wî jî biryara xwe bi berxwedanê, pêdariyê û bi rûxistina sazûmanê standibe, wê hîngê di ew pevçûna duqolî de, herdu alî, ango sazûman û gel, dikevin rewşa pevçûneke dijwar, germ û xwînî jî; ji ber ku ji aliyekî de, sazûmana diktetor û da ku kanibe bi şêweyekî "zagonî û rewa!" hêza xwe ya çekdar bi kar wîne, bi her hawakî pêkol dike, daku: Yan şoreşê bi darê zorê rawstîne, yan jî wê ji rewşa tevgera sivîl derxîne, û neçar bike ew bibe tevgereke çekdar, li aliyê din jî, gel jî neçar dibe: Yan serhildana xwe rawestîne, û yan jî bervaniya xwe bi hemî şêweyan û di nav şêweyê çakdar û tund jî bike, digel ku.. mixabin! ew herdu rê jî, ji aliyekî de zor metirsîdar in, û ji aliyekî din de, ew dixwazên sazûmanê bi xwe û armanca wî pêk tên.

Belê! Rewşa şoreşa gelê Sûryê, piştî deh mehan gihaye vê qonaqê; Ango: Baş diyar bûye ku sazûman bi tevahî û serokê wê bi taybetî, biryara xwe daye ku destlatê bernade, û bi îsrar e, ku hemî hêza bi kar wîne daku serhildana gel a ji bingeha xwe de sivîl û aştiyane ye rawestînin, yan neçar bike serhildêr jî berê xebata medenî û bêçek biguhêrin, û yan çekan hilgirin, yan jî alîkariya leşgerî ji derve bixwezin, temam wekî ku niha dibe, wê gavê, hemî rûpel bi nav hev dikevin, û paşroja şoreşê û Sûryê bi xwe jî dikeve bin mij û dûmaneke giran.

Bi rastî jî, herkes kane bê erêna bêjin, ku mixabin! sazûmanê tevahiya rewşa Sûryê gihandiye ew dereceya zor xirab û paşeroja nediyar, û sûryayê, xak û mirov, wêran dike û kiriye gola xwînê.

## Tirba Şêx Seîd di bexçeyê Mala Leşkerîyê ya Amedê de ye



Şêx Seîd'ê ku di sala 1925' an de bi hinceta serhildanê ji alîyê dadgehên Îstîklalê vê hate darve kirin tirba wî ne diyar e. Ehlên Şêx Seîd bi rîya fermî serî li dewletê dan ku cihê tirba wî were dîya[r] kirin.Heta niha tirba Şêx Seî[d] ... hate veşartin. Lê êdî nevîyên Şêx Seîd dixwazin gavên eşkere werin avêtin û di çarcovê de nevîyê Şêx Seîd parêzer Abdurrahim Firat bi fermî serî li dewletê da.Firat îdîa kir ku tirba Şêx Seîd di bexçeyê Mala Lêşkerî ya Diyarbekirê de ye.Firat xwest ku dewlet hestîyên Şêx Seîd û 46 hevalên wî bidine eqrebayên wan. Firat bal kişande ser kolanên kuştîyên ne diyar û got " darvekirin ne kiryar nedîyar e,dewlet dizane bê tirba van kesan li kîderê ye."

www.arsivakurdi.org

# Bîranîna Xebatkar M. E Xoce

**Dr.Xelîl Ebdela**

Bi boneya 46 saliya goçbarkirina xebatkarê Kurd , Mihemed Elî Xoce, li bajarê Silêmaniyê şevek li darket. Bi vê boneyê hevriyê wî, Dr. Xelîl Mihemed Ebdela nameyek bi rêkiribû û ji hêla rojnemevan Hozan Xelîl Efrînî ve hate xwendin.

Amadevanên hêja



Di serî de ez silav û rêzên xwe pêşkêş we hemuyan dikim.

Hevalê xebatkar û nîştimanperwer yê dilsoz Mihemed Elî Xoce.

Hevalê M.E. Xoce ji Kurdên Kurdistana Rojavayê bû, ew di dibistanan de mamoste bû, zarok fêrî xwendinê dikirn.

Destpêka naskirina me li dor sala 1950`î bû, di sala 1957`an de, xebata Kurdeyetî, siyasî û nîştimanî rêkûpêk bû, ne liserhevbû, bi şêwayekî civakî û komeleyetî bû.

Di havîna 1957`an de, piştî ku me û ew kesên ku bi Kurdeyetiyê ve mijûl dibûn hatin serhev û me Partiya Demokrat a Kurd li Sûriye damezrand.

Hevalê birêz û bi rûmet M. E . Xoce, yek ji wan hevalên ku partî damezrandî bû.

Hevalê M. E. Xoce, hevalekî miletperwer bû, xebatkar bû, ti caran ji xebata partiyê nedima, çalak û jîr bû.

Di Sala 1958`an`de yekîtiyê Sûriye û Misrê çêbû û bi çêbûna vê yekîtiyê re, ewreke reş û tarî hate ser Sûriyê, jiyana demokratîk têkçû, zulm û zordarî û terorê dest pêkir û partiyên pêşverû ketine tengahiyê û jiyan û xebata veşartî.

Di sala 1959`an de, hevalê me M. E. Xoce derbasî Êraqê bû ew û mamoste Cegerxwîn gihîştin hev Piştî demekê di wa salê de, 1959`an, ez jî derbasî Êraqê bûm. Lê piştî çend mehan hevalê Beşîr Sebrî jî hate Êraqê, her weha em çar kes gihîştin hev.

Ji havîna 1959`an bo havîna 1961`an, em her çar bi hev re bûn û bi hev re dijyan.

Li Êraqê hevalê me, M. E. Xoce, di beşê Kurdî yê Radyoya Bexdadê de kar dikir, danûstandina me bi Partiya Demokrat a Kurdistana Êraqê re bû, roj bi roj rewşa siyasî ya Êraqê berve xerabiyê diçû.

Partiya Demokrat a Kurdistana Êraqê, gelek şiyar bû, wî zanîbû ku karbidestên Êraqê, wê şerê wan bikin, lewra jî xwe amadekir û hêdî hêdî ji Bexdadê vekişiya Kurdistanê.

Di vê demê de, seydayê bavê Kurdan, Mistefa Barzanî li Moskoyê bû, li kongireya Partiya Komenîst ya Yekîtiya Soviyeta berê amade bû, piştî ku vegeriya bo Êraqê, em her sê kes ji bo şandina ji Rûsiye re qebûlkirin, ez û Beşîr Sebrî û Mihemed Elî Xoca bûn.

Lê Hevalê me Xoce, nexwest here Rûsiyeyê, ji ber ku temenê wî mezin bû û mal û zarokên wî li Sûriye bûn.

Her weha bi firmêskan me xatir ji hev xwest. Ew bi hevalên Êraqê re cû Kurdistanê û ez û Beşîr Sebrî, di 1961`an de, cûn Rûsiyeyê.

Piştî demeke ne dûr û dirêj şer li Kurdistanê dest pê kir û hevalê me Xoce bi dilgermî û mêrxasî kete nava ceng û şerî pîroz.

www.arsivakurdi.org

# Gotina "ENKS" di konferansa Hewlêrê de

Serokê herêma kurdistana Iraqê kak Mesûd Barzanî, Serokê hikûmeta kurdistana Iraqê Dr. Berhem Salih.

Serokê perlemana herêma kurdistana Iraqê birêz Kemal Kerkûkî, Nûnerên hemî partî û saziyên beşdar, Endamên konferansa Hewlêrê.

Xwîşk û birayên hêja û dela….

Ji we hemiyan re rêz û silavên germ

Di destpêkê de, ez bi navê komîteya rêvebir ya Encûmana Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê zor spasiya serok Mesûd Barzanî û hikûmeta herêma kurdistana Iraqê li ser piştgirî û alîkariya ji bo lidarxistina vî konferansî dikin. Herweha em spasiya komîteya amedekar ya konferansa Hewlêrê li ser vê xebata nirxbilind ji bo pirsa gelê me yê kurd ji Sûriyê li derveyî welat dikin.

Xwîşk û birayên hêja û dela…

Ji roja serxwebûna Sûriyê di sala 1946 an de, ta roja îro bi nasnameya netewî ya gelê me yê kurd li Sûriyê ne hatiye venasîn û mafên me yên netewî wek miletekî sereke ku li ser xaka bav û kalên xwe di rohilata navîn de dijî hatine binpêkirin, û gelelk projeyên şofînî û awirte ji aliyê rêjîma Beis ve ji bo tunekirina nasnameya me ya netewî li Sûriyê hatine bikaranîn, herweha gelek zilm û zor di mafê gelê me de hatiye kirin, bi hezaran hatine girtin û êşkencekirin û bi dehan hatine kuştin.

Lê îro em li ber fersendeke dîrikîne, piştî ku şoreşa azadiyê li Sûriyê di 15-3-2011 an de destpêkir, miletê me yê kurd jî bêdudilî li rex biraderên xwe yên ereb û neteweyên din wek erkekî niştimanî tevlî şoreşê bû, em di xebata xwe ya li dijî zilm û zorê û newekheviyê de berdewamin û divê em hemî bi hev re karbikin û helwesta xwe ya siyasî û karê xwe yê meydanî bikin yek, ta ku em jî di têkbirina rêjîma Beis de di alîkarbin û em mafên gelê xwe yên netewî di destûra Sûriya nû de biçespînin û bêpar ji buhara guhertinê dernekevin.

Piştî tevlêbûn û xurtbûna beşdariya gelê me yê kurd di şoreşa Sûriyê de, me karîbû beşekî mezin ji hêzên gelê xwe yê kurd bighînin hev û wan li hev kom bikin û di 26-10-2011 an de kongireyeke xwe ye niştimanî lidarbixin û li ser gelek daxwaz û biryaran lihev bikin, ji encamên herî girîng û balkêş di kongreya me de, damezirandina Encûmana Niştimanî ya Kurdî bû, me xwe wek beşekeî sereke ji oposîzyon û şoreşê di Sûriyê ragihand û me biryara daxwaza mafê çarenûsî ji bo gelê xwe yê kurd di hindirê Sûriyê stend, herweha emê ji bo guhertina rêjîma Beis xebatê berdewam bikin ta ku têkhere, ji ber em bawerin ku ew jî kar û erkekî niştimaniye, eme bi hemwelatiyên xwe yên Sûrî re welatekî demoqrat û hevpar û yekbûyî ava bikin.

Xwîşk û birayên hêja û dela..

Ev konferansa we jî ji bo piştgirî û alîkarî û serkeftina şoreşa miletê me yê Sûriyê û bidestxistina mafên netewî yên miletê me yê kurd gaveke hêja û zor pîroze, em bawerin ku win jî li derveyî welat ji bo me alîkar û piştgirin, em baş dizanin û têdighin ku li welatên xerîbiyê dem û hiş û dilên we li ser miletê we yê li hindir welate, haya me baş ji kar û xebata we yê pîroz û nirxbilind heye.

Li dawiyê hêviya me ewe ku em û we destên xwe di destên hevkin û bê rawestandin xebatê ji bo bidestxistina mafên miletê xwe berdewam bikin û qet ranewestin, ta ku em bighin roja azadiyê û venasîna destûrî bi mafê çarenûsî ji gelê me yê kurd re di hindirê Sûriya nû ya demoqrat û hevpar û yekbûyî de, serkeftinê ji we re di vî konferansî de hêvî dikim û zor spasî ji bo we hemiyan û sed silav .

Hewlêr 18-01-2102

www.arsivakurdi.org

# Panorama
## Rêweresma Şehîdê Azadiyê û Rûmetê Dr.Şêrzad Hac Reşîd (Elemdar)

**Li** roja Pêncşemê 9.2.2012z-2623k , dora heft û nîvê êvarî , hevalê nemir Dr.Şêrzad ji aliyê hin kuştiyaran ve – tevî otombîla xwe li bajarê Helebê hate revandin û kuştin .Li roja dî sibehê,heval,meriv û xismên wî nûçeya reş a kuştinê hat bihîstin û dûre cenaza wî ji pijîşkxanê derxistin û birin li çêxaneya osman (taxa Eşrefiyê) danîn.

Li roja Şemiyê , kat neh û nîvê sibehê, bi sedan meriv,heval,dost,berketî û rêvebirên Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê , cenaza pakrewan bi gul û çîçek,wêneyên wî , girî û şîn û lîliyan ji çêxaneyê deranîn û berve cîzayîna wî(gundê Elemdara) ve birin. Li ser riya Efrînê , nêzîk gundê Lêremûnê karwan careke dî hinekî rawest , ta ku , li saz bikeve û wêne bi otombîlan dikevin. Li kat dehan karwana cenazê berve kurdaxê bi rê ket. Li nêzîk mezela zareta Henên , ji aliyê gelek hevalên wî û xelkê kurdaxê ve tevî hildana ala rengîn , simbola partiyê û wêneyên wî-cenaze Dr hate pêşewazîkirin, û dîsa li destpêka bajarê Efrîn ê pêşewaziya wî dubare bû. Her çû karwan mezin bû û weha di nav bajarê xemgîn re hate derbaskirin. Li destpêka bajaroka Reco ve jî, ji aliyê heval û hogirên wî ve pêşwaz bû. Û weha domand ta giha gundê Elemdara mala Bavê Şêrzad .Bi beşdariya bêtirî deh hezar xelkê me yê kurd , nûnertiyên rêxistinên P.Y.D.Ks ên kobaniyê û Reqê – di pêşî de ,gelek komikên folklorî û giropek ji pijîşkan bi cilên xwe yên fermî – Cenaza hevalê Şêrzad ji malê bi derxistin û bi dilên xemgîn , çavên ziwa, girî û şîn , berdana gulan, siloganên Azadî û nerazîbûnê û sitranên Şivan Perwer , govdeyê nemirê me , di goristana gund de hate binaxkirin. Piştî telqîn mele ji giyana wî re , rêweresma gotinan dest pê kir. Kêlîkek bêdeng li ser giyana pakrewanê me hate rawestandin, sipasiya beşdaran bû , gotina rêxistina xwendekaran a P.Y.D.Ks li Heleb, gotina Buhara Kurdî,gotina şêxê Ezdiyan û paşê jî gotina P.Y.D.Ks ji aliyê sekreterê partiyê mamoste Mihyedîn Şêx Alî ve hatin xwendin. Û bi dehan birûskên sersaxiyê yên ji encûmena kurdî ,partî,sekretêr, rewşenbîr, siyasetmedar û kesatiyên serbixwe ve ji aliyê pêşkêşvan ve hatine zimên . Li dawiyê ji aliyê beşdaran ve, meriv û hevalên wî hatin sersaxiyê bi hebûna xwediyan, sekretêrê û gelek rêvebirên P.Y.D.Ks çar rojan li Gundê Elemdara dirêj kir.

**Gotina komîta bijîjkan ya Buhara kurdî di rêwresma pakrewan Dr. Şêrzad Hac Reşîd li gundê Elemdara – Kurdax roja 11.02.2012**

Îro rojek xemgîne , rojek bi şîne , rojek tarî ye .

Vaye em dispêrin gorê , ciwanekî , bijîjkekî , paşerojekî , erê paşerojekî .

Ku em tev li hêviyê bûn , welat hemû li hêviyê bû …

Kek Şêrzad ….

Ên ku jiyana te vemirandin , xwastin giyanê me vemirînin .

Kek Şêrzad ….

Ên ku jiyana te dizîn , xwastin xewnên me bidizin .

Kek Şêrzad ….

Ên ku kenê te kuştin , xwastin buharê di vê erdê de bikujin , lê buhar namirê … buhar namirê .

**Xwîşk û birayên delal …**

Tiştê li vê welatî dibe , divê em bi hişmendî, li ser rawestin , da ku gel û welatê me di zêrzemînek reş werenebe .

Em banga gelê xwe û hêzên xwe yên siyasî dikin , ku rê nedin destên qirêj û tarî têkevin nav me û bi paşeroja me bilîzin .

Dilovaniya Xwedê li te be , Şehîdê Efrînê …

Dilovaniya Xwedê li te be D.R ( 7 )

www.arsivakurdi.org


Şehîdê vî welatî …
Dilovaniya Xwedê li te be , Şehîdê xewna me
***********************************

Di rêwresmên behiya Şêrzad de, li bajarê Herne/Elmanya, ji hêla mamoste Heyder Omer , ev deqê jêrîn hate xwendin.

## Li kujerê Şêrzad digerim

*Diyarî ji bo giyanê Şêrzad; kulîka ciwanan*

Sala 1991ê min di helbestekê de got: Kurdo! Bi kurdî rabe û daniş bi kurdî. Bi kurdî buxwe û vexwe bi kurdî. Bi kurdî govendê girêde û biken kurdî, ne tenê her tim tu digrî bi kurdî.




Ji wê rojê de, ez li xwe digerim, li te digerim, li wê û wî digerim, li wan digerim. Ne min xwe dît, ne hûn û ne ew. Tenê min rondikên kurdî û refê tîtiyan dîtin.

Ji sala 1965ê heya sala 2012ê, min ne pirtûkek û ne defterek hêşt, ne kovarek û ne rojnameyek hêşt, ne pênûsek û ne elfebayek hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digerim. Min xwe û hûn û 32 patrî dîtin.
Ji wê hîngê de, min ne helbestvanek û ne nivîsevanek hêşt, ne nezanek û ne zanayek hêşt, ne rewşenbîrek û ne fîlozofek hêşt, ne şagirtek û ne maosteyek hêşt, ne bervedêrek û ne bijîjkek hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digerim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtin.
Ji wê hîngê de, min ne dengbêjek û ne sergovendek hêşt, ne bilûrvanek ne tenbûrvanek hêşt, ne gundiyek ne bajariyek hêşk, ne cotkarek ne karkerek hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digerim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtin.
Ji wê hîngê de, min ne olek û ne ayînek hêşt, ne mezhebek û ne têorek hêşt, ne dostek û ne dijminek hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digerim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtin.
Ji wê hîngê de, min ne keçek û ne xortek hêşt, ne mêrek û ne jinek hêşt, ne biçûkek û mezinek hêşt, ne kalek û ne pîrejinek, hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digerim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtin.
Ji wê hîngê de, Ji çemê Dicle û ji Eyndîwarê heya çemê Êfrîn Çiyayê Kurmênc, min ne girek hêşk, ne deştek hêşt, ne pesarek û ne dagerînek hêşt, ne baxek û daristanek hêşt, ne gundek û ne bajarek hêşt, ne kolanek û ne berqefek hêşt, ne şikeftek û ne serayek hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digerim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtin.

Langenhagen/Elmanya, 18. 02. 2012

*******************************

Ji **Amedê jî kek Îbrahîm GUÇLU**, bi boneya sersaxiyê , ev deqê jêrîn bi rêkiribû.



Heval, Dostên Hêja …
Min bi gelek xemgînî bihîst ku Dr. Ş;êrzad Hac Reşîd, birayê hêja endamê Rêxistina Helebê ya PYDKS ê, di 09. 02. 2012-an de nêzî nexweşxaneya El-Eleml ji aliyê sixûr û xwînmijên dehaqî Dîktatoriya Esad û an jî hevalbendên wan yên kurd de hatiye revandin û hatiye kuştin.
Ev kuştinên kurd û ereban, qetlîama Dîktatorıa Esad/Baasê nikare pêşiya hilweşandina xwe bigre. Lewra tê zanîn ku rejîma baasê û zihniyeta baasî ji derveyî zihniyeta sedasala 21-an, ji derveyî demokrasî û maf-azadiyên mirovî ye.

**D.R 8**


www.arsivakurdi.org

# Nameyek ji kek Riza Çolpan ê Dêrsimî

Riza Çolpan ê Dêrsimî

Roj baş Kek Newaf! 16-1-2012 23-05 PM

Gelek spas jibo e-maîlkirina te ya Newroz. Bawer bike gelek kêsxweş bûm, lê hûn di nivîsa min da hin peyvan diguhêrînin, wek xwe dinivîsînin, ku ev jî jibo nivîskar ne tevgerek xweş e. Mînak: we gîşt kirîye "Giş" piştî û we bêhnok danîye; li milê dî ez di cîyê "De" da"Da" dibêjim, we kirîye "De". Min gotîye "Mistê Kor" we kirîye "Mistê Kûr" di cîyê "Pûmê kor" -jibo kund- we kirîye "Bûmê kûr.



Herwaha kekê can, hêvî dikim hûn min şaş fêm nekin, ez ne zimanzan im, lê ez dixwazim wek xwe binivîsînim, ta ku zimanê me yê yekgirtî çêbibe. Zimanê Hawarê li gor bawerîya min tenê bi zara Botan hatîye amadekirin, ku ev jî kêmasîyek e, divê em bipejirînin. Di hemû cîhanê da ziman li gor şert û şûrtên jîyanek nûjen tên guhartin. Gelek heval, gelek nivîskar "Celadet Bedîrxan usa nivîsîye, divê em jî wek wî binivîsînin" dibêjin, lê dîsa li gor bawerîya ev gotin û xoşmê jî Mantiq- şaş e. Wî kalikê me bingeha rêziman xweş danîye, lê di ware hemû zaravên zimanê Kurdî da kêmasî hene, divê zimanzanên Kurd van kêmasîyan dîsa bi navê wî gorbihiştî serast bikin. Dûra divê em ji xoşmêjîya demînbûnê, ango fanatîzmê dûr bisekinin. Her tişt tê guhartin, divê were guhartin ku bersîva şert û şûrtên demê bide. Heqê me tune em zimanê Hawarê wek îslamên hoyandinoki bikin eyatên quranê, bibêjin "Zimanê hawarê nay guhartin".

Birayê minê delal û xoşewîst, hêvî dikim tu min şaş fêm nekî, ev rexneyên biratîyêne.

Carek dî bi dil û can ji te ra hezar carî spas. Têm çavên te û herdu xortan maç dikim, ji xuşka xwe ra silavên biratî rêdikim. Ji hemû nasan ra silavên min bêje. Mahfûze û zarokên wê baş in, gîşt gelek jîr û bihiş in, dixwînin.

têbinî:

Li wir, ango li Sûrîye rewş di çi encamê da ye, ji kerema xwe min ra bi kurtî binivîsîne. Bimîne di xweşîyê da. Rizo yê Dersimî.

********************************

Dumahîk: **Nameya Kek Îbrahîm**…

Şêhîdbûna Dr. Şêrzad hîç şik tune ye ku hemû miletên kurd xemgîn kir.

Ez û malbata min jî gelek xemgîn bûn.

Şêhîdbûna Dr. Şêrzad dîsa bû wesîle ku ez/em xwînxwarî û barbariya rejîma baasê ya dîktator û kolonyalîst nas bikin û li hemberî ev rêjîma ne mirovane şer bikin.

Kurdistan û miletê kurd yek e, ji aliyê dewletên metîngehkar/kolonyalîst de bi Peymana Lozanê hat parçe kirin. Divê em kurd li her beşekî Kurdistanê dest û mil bidin hev. Lewra berjewendiya kurdên hemû beşan hevbeş e. Li Beşa Başurê-Rojavayê Kurdistanê azadî û desthilatdarî, bi wateyek desthilatdariya beşê din e.

Ez ji bona malbat û hevalên Dr. Şêrzad û meiletê me yê kurd ser saxî dixwazim.

Xwedê sebir bide malbat û hevalên wî.

Divê ku em ji xebat û têkoşîna wî re xwedî derkevin.

Bimînin di xêr û xweşiyê de.

Amed/Bakurê Kurdistanê

Birayê We Îbrahîm GUÇLU

www.arsivakurdi.org

## Nivîsandina bi zimanê Kurdî pêdiviyeke netewî ye

Mûsa Zaxuranî

Nivîsandina bi zimanê Kurdî pêdiviyeke netewî ye. Ger rola ziman ne giring bana, şûvîniyan şerê wî bi vî awayê tûj nedikirin, lewra jî nabe kes zimanê xwe di ser guhên xwe re bavêje.. Her wiha divê em bizanin ku ji bo tinekirina ziman bi xwe, şerê navên bi Kurdî hate kirin di wextekî de.. Bi bafîka çend tişt û sedemên şaş û ne dicih de, di virde dipirsim; gelo ev kesên giringiya zimanê Kurdî nabînin çi nava li zarokên xwe dikin..?

Weke ez bawerim, divê her mirovek wî endamê laşê xwe ku birîndare derman bike. Destê wî bi êş be, divê destê xwe derman bike.. Lingê wî şikestî be an birîndar be gereke wî derman bike.. Zimanê wî şikestî be, birîndar be divê zimanê xwe derman bike.. Birano! Ev zimanê ku bav û bapîrên me ew parastine di wan rewş û şevên tarî de divê em jî wî biparîzin û xweş û geş kin di van rojên xweştir û ronîtir de, çiko zimanê me nişaneke ber çave ji me re.. tîpeke girse ji tîpên hebûna me, nemaze li gor rewş û doz û maf û hebûna me.. Ji me tê xwestin em gotinên xebatkar û navdarê hêja Dr. Nûreddîn Zaza bînin ziman:

"Gelî Kurdan!

Eger hûn naxwazin ji hev tarûmar û winda bibin, berî her tiştî, zimanê xwe bixwînin û bidinxwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hez kirin, û bi hevaltî û dostanîya miletên din re pêş ve herin, û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin".

Rewşenbîr û helbestvanên Kurd bi çi zimanî dinivîsin, ser sera û ser çava, kes ne dijî wa ye, bera xwe û Kurdan bi biyaniyan bidin naskirin lê divê bi zimanê xwe jî binivîsin, her wiha ji wan tête xwestin ku nivîsên Kurdî wergerînin zimanên din, da çand û hunera Kurdî bi biyaniyan bidin nasîn û xweşiyê di navbera Kurd û biyaniyan de biçînin.. Jixwe ger dibistanên zimanê me hebûna wê rewşa wî xweş ba û hindik kes û xebat jêre diva.. Ev rewşa wî a nexweş dihêla em bêjin nivîsandina Kurdî pêdivî ye.. û bêguman diyare sedemên vê rewşê çine.. Bi baweriya min ne raste û ne baş e kurê wî Gorgînê ku ji Kurdî pêve xwe nizanîbû, nikaribe bi Kurdî binûse yan nikaribe xwe hînî nivîsandina bi Kurdî bike..

Bivê nevê îro be , sed salî din be wê welatekî Kurdan jî hebe dê endam be di Netewên Yekbûyî de, vêca dipirsim, gelo zimanê wî welatî wê çi be, wê Farsî be yan tirkî be yan .. yan Kurdî be? Bêguman raste ew peyva ku dibêje roj bi seradê nayê veşartin.. Ew kesên ku nizanim çend salan bi zimanekî biyanî xwendiye, wî kesî bi xwe ew sal û şeş salên din di ser de bi Kurdî, li mala xwe bi bira, bav, dê û hevalên re peyivîye.. Ma ne wilo ye?

Xwendevano! Ew Kurdê bi Kurdî dinivîse du caran Kurd e lê yê bi zimanekê din dinivîse careke tenê Kurd e.. Ev baweriya min e, bê ku ez riwê xwe ji ti zimanî biguherim.. Û xwezî mirov karîba bi deh zimanan binivîse, lê ji ber ku zimanê me yê netewî nexweş e û birîndare her roj wî didin dadgehan ji me tê xwestin em wî derman bikin. Kurd tuxmekî baş in, nabe ku xwe gunehkar kin li ber kur û neviyên xwe..

Pirseke min ji rewşenbîrên Kurd heye; gelo ne şerm û fîhête mirovek bêje; ez rewşenbîrekî Kurd im û nizanibe bi Kurdî binûse ?! Û ji zû ve helbestvanê netewî Cegerxwîn gotiye: Şerm û esefe ger tu bi zarê xwe nexwînê..

21 heyva dudiwan roja zimane, bi biryara Netewên Yekbûyî, divê em bizanin; zimanê me çiye, me çi jêre kiriye, çi jêre dive.. Her kes li gor imkanên xwe.. Jixwe nabe ku ev zimanê 25 melyon Kurd ku li Tirkiyê bi tenê dijîn, heta îro qedexe be..?! Lewra ev ziman hêja ye ku mirovê Kurd canê xwe di ber de bide û ez vê rojê li her zimanî pîroz dikim, lê pêşî li zimanê kurdî, zimanê Mem û Zînê û hêvîdarim ev roj bandoreke çak li zimanê me bike, şoreşa vî zimanî li Kurdistana bakur geştir bike, nivîsandina bi Kurdî di nav me de têr û pir bike, nivîskarên vî zimanî dilxweş bike, xebatkar û hezkiriên vî zimanê dilşad bike û sala werê bi sedan dibistanên zimanê Kurdî li Kurdistana bakur hebin û zimanê me di nav zimanan de serbilind be.

Qamişlo. **Ji Malpera Welatê me hatiye girtin**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Gotina….**

ku tevgera kurd bêtir hişyar be , da ku bi hêsanî , kurd nekevine zikê pîlan û xefkên siyaseta navnetewî ya ku bawerî pê zehmet û tehlûke ye .
Astengî û rewşa zor taybet û awarte , ya ku Sûriya ev e 11 heyvin tê de dijî û dikele , rojane bi dehan kuştî , birîndar û bi sedan girtî dibine qurban …. hwd , bê guman rijîma Be'is , karbedestiya sîstema yekpartî – modêla Şawşêsko – di ber de berpirsiyar e , û segermî , tund û tûjî – ji kîjan hêlê de dibe bila bibe – wê tu caran rê li ber çareseriyeke siyasî veneke . Di vî warî de , kurd duh jî , îro jî , ne bi gurkirin , tund û tûjî yê re ne .
Bikaranîna hestên dîn-deyanetê , bona siyaset û berjewendiyan , li ba piraniya kurdan li Sûriyê , ciyê şermezarî û xemgîniyê ye , ji ber ku ev yeka he , netenê yekîtiya civaka Sûrî birîn dike û ji hev dixe , lê belê , rê li ber guhartina demokratîk û çareserkirina pirsa netewî ya gelê kurd dixetimîne.

Rastiya tabloya civakî ew e ku gelê Sûrî , ji bilî pirsa herdu netewayetiyên sereke , erebperwerî û kurperwerî , dixuyê ku mijûlbûn û gizgizî bi hêla pirsa mislmantiya Sunnî , Elewî , Durzî û Îsma'îlî , ji bilî taybetmendiya rewşa biraderên Fille ve , tête xebitandin , digel navnîşanên dî mîna Eşîrperstiyê … hwd . Kurd di vê derbarê de , bi siyaset û helwestên xwe , bi giranî û çalakiyên xwe yên pîvayî , di parastina yekîtiya Sûriyê de bûne stûneke bingehîn, ji ber ku , bawerî her li cî ye ku , parastina jiyan û berjewendiya gelê kurd û çaraserkirina pirsa wî ya netewî , her dê di çerçewa yekîtiya Sûriya û jiyaneke demokratîk de be , jiyaneke ku mafên mirovan tê de bêne parastin û binpê nebin , rûmet , azadî , maf û wekheviya gelan bêne rêzgirtin.

Li dawî , supasî digel rêz û hurmet ji serokatî û hikûmeta herêma kurdistanê re , ku karîbûn rê bidine lidarxistina konferanseke weha , û jê re piştgir bin . Supasî digel rêz û hurmet ji kar û barên komîta amedekar re . Serkeftin ji doza Aştî , Azadî û Wekheviyê re Ji doza gelê kurd a dadmend re …

**Birayê we**
**Mihyedîn Şêx Allî**
Sekretêrê parta yekîtî ya demokrat a kurd li Sûriyê. Heleb 26.01.2012

**Gotina ku ji Konferensa kurdên Sûriyê li derve re birêbûye , yê ku li Hewlêr ê – Kurdistana Îraqê hatiye girêdan di 28 – 29 . 01 . 2012 an de , û wa hîngê ketiye destê dîwana serokatiyê da ku bibe ji belgeyên konferans**
*************************************

## Her çar demjimêran yek îdam

**Federasyona Navnetewî a Civakên Mafê Mirovan û Civaka Mafê Mirov li Îranê, di daxuyaniyek hevpar de ragihandin ku evsal, di her 4 demjimêran de kesek hatiye bidarvekirin.**



**Li gorî vê daxuyaniyê tenê ji 1 heya 8'ê Çileya Paşîn a sala 2012'an 39 kes di bajarên cur bi cur ên Îranê de hatine bidarvekirin.**

Di vê daxuyaniyê de herweha tevî baskirin ji derkirina hukmê bidarvekirinê ji bo Emîr Mîrzayiyê Hikmetî, Amrîkayiyê bi esla xwe Îranî, bi tometa sîxoriya ji bo Amerîkayê û herweha Ehmedriza Haşimniya, Wehîd Esxerî û Seîd Melikpûr gelaledarêjên malperên întêrnêtî, qala zextên rejîma Îranê li ser girtiyan, bona wergirtina îtirafan ji wan hatiye kirin.
Li gor rapora lêborîna navnetewî, di 11 mehên sala 2011'an de pitir ji 600 kes di Îranê de hatine daliqandin ku ew hejmar li gorî îdamkirina aliyê kêm 553 kesan di sala 2010'an de, hejmarek zêde û berbiçav e.

**Ji kovara Agirî. H. 175**

www.arsivakurdi.org

û li gor demê bin .

Di vî warî de , lidarxistina kongira nîştimanî ya kurd li Sûriyê di meha Tişrîna yekê sala borî de , pêwîstiyeke dîrokî bû , û çendî têbîn û rexne hebin , divê bête parastin , da em karibin bi hev re nûjen bikin .

Partiyên tevgera nîştimanî ya kurd li Sûriyê yên ku , li ser daxweza wan , ew kongireya hatibû lidarxistin , li vê dawiyê , li gor biryara kongir û civata fermî ya serkirdayetiya Encûmena nîştimanî ya kurd , biryar dabûn ku , endametiya xwe di çerçeweyên hêzên rikebir a erebî-Sûrî de bidin rawestandin û jê vekêşin , da ku partiyên kurd li hev dû vegerin û bi yekrêzî bi hev re , xwedî helwest , bi rû , û kesayetiyeke serbixwe bin , da karibin nûnertiya gelê xwe yê xêrnedî bikin . Ev gava he , divê neyê fêmkirin ku – xwedê giravî – tevgera kurd li Sûriyê berê xwe ji rikebiriya Sûriyê diguhêre , û deriyên hevkarî û piştevaniyê digel hêzên rikebir ên erebî Sûrî hatine girtin . Armanc û pêdivî ewe ku , di pey vê gavê re , rê li ber nelihevî û dubendîtî di çerçewa tevgera kurd de bête birîn , û kurd li Sûriyê di helwest û çalakiyên xwe de , ne belawela bin , û di bin kartêkirina nav û durişmên hinde hêzên rikebiriya Sûrî de , bi erzanî nebine berdevik û karmend . Li hêla dî armanc ewe ku , nûnertiya tevgera siyasî ya kurd bi navê Encûmenî nîştimanî kurd li Sûriya , çi li hundir û çi li derve , bêtir bi roleke zîrek û erênî rabe , û di berhevhatin û lihevkirina hêzên rikebiriya Sûriyê de , xwedî rol û helwesteke berpirsiyar û demokratîk be.

**Beşdarên birêz …**

Di Arşîf û dîroka jiyana siyasî ya Sûriyê de , li sala 1957 -an , kurd yekemîn hêzî siyasî tenha bi tenê bûn ku , partiya wan peyva demokrasiyê bi kar aniye , lê bûye xwedî , û di ber de ta nuha xebitiye… Çep û rastê ereb , çi partiya komonîst , çi Îxwan mislimîn û Be'is … hwd , peyva demokrasiyê , hevok û wateya mafên mirovan , ne di bîr û pirogramên wan de bûn , loma jî , tevgera siyasî ya kurd bi dijwarî û di heyameke zor zehmet de xebata xwe domandiye û her dê bidomîne . Bi hezaran camêr ketine zîndanan û bi deh hezaran koçber bûne , ji bilî yên ku jiyana xwe ji dest dane , hatine kuştin û di ber kurdperwerî , demokrasî û mafên mirovan de , bûne Şehîd .

Rastiya hebûna kurd li Sûriyayê bi tevgera wan a siyasî ve , duh jî û îro jî , li beramber nebûna demokrasiyê û siyaseta fermî ya rijîmên dewleta Sûriyê rikebirî bi xwe ye , û ne rikebiriyeke demsalî ye . Lewre jî , guhartineke rastî , berfireh û tevahî di rewşa Sûriyê de , daxwaz û pêwîstiyeke civakî û dîrokî ye , da ku stûn û bingehên rijîma tekpartî ji holê rabe , û Sûriyeke nû riya xwe bibîne . Eve daxwaz û berjewendiya gelê kurd e , weke çawa daxwaz û berjewendiya tevahiya xelkê Sûrî ye . Lê , pêkanîna vê guhartinê , çendî aştiyane be , ewqas kurd û ereb û hemî çûknetew û rengên dî li karê ne , lewre jî , daxwaza lezgîn ewe ku , pêşî xwînrijandin raweste , û ew sînaryoyên destêwerdana leşkerî di bin çi perdê de dibe bila bibe , ger bête holê , xwîn dê bêtir biherike , çavsorî , dijatî , kuştin , tevlihevî , talan û alozî , li seranserî herêm û civaka Sûrî , dê bêtir belav bibe . Di vê pêvajoyê de , tevgera siyasî ya kurd xwedî helwest û roleke dîrokî ye ku yekcar û yekser , rêbaza aştiyane diparêze , û şêweyên leşkerî serûber napejirîne û nabîne ku çekdarkirina xelk û kesên serhildêr , wê di xizmet pêşeroj û berjewendiya gelê Sûrî de be .

Li hêla dî , divê bête zanîn ku , taybetmendiya rewşa kurd li Sûriyê , nemaze di warê dîmografî û jihevcudabûna hersê herêman **( Çiyayên Kurdaxê – Efrîn , Kobanî , Cizîrê )** di tixûb û sînorê Sûriya – Turkiya ya navdewletî de , li dirêjahiya 910 KM , û taybetmendiya cîgehê Sûriyê li rojhilatî behra Sipî , dihêle **D. R. (10)**



**Nemir Dr . Şêrzad Hec Reşîd**
**( 1987 – 2012 )**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org